

Xizmeta Rehberiyê ji bo Tendurustiyê li Navenda Malbatên Dibistanê Seretayî li Kolnê



**Kurdisch**

**Xizmeta Rehberiyê ji bo  
Tendurustiyê li Navenda  
Malbatên Dibistanê  
Seretayî li Kolnê**

## Derbarê me de

Xizmeta Rehberiya Tendurustiyê, xizmetek e ku li 9 navendêñ malbatêñ dibistanêñ seretayî yên li Kolnê tê dayîn. Armanca wê xwendekar, malbatêñ wan û personelêñ xizmetê yên dibistanan in.

Rehberên Tendurustiyê, nexweşyarêñ perwer-dekirî yên zarokan in û derbarê hemû mijarêñ wek xizmetêñ tendurustiyê, nexweşî û pêşîlê-girtina nexweşiyê rê nîşan didin.

Armanca vê xizmetê ew e kubihêle zarok, bi qasî ku mumkun be, tendurustî mezin bibin.

- Zarokê te her westiyayî û bêhal e?
- Xwarinê baş naxwe?
- Şîkayetêñ wî/wê yên ku dubare dibil hene an jî nexweşiyek wî/wê ya kronîk?
- Gelo hûn ne emîn in ku divê hûn herin doktor an na?
- Ji bo dîtina doktorekî/a munasib hûn hewcedarê alîkariyê ne?

Ger wisa be, kerem bikin, bi me re biaxivin!

Ji bo ku em ji hevdû baş têbigihîjin, rehberên me yên tendurustiyê ji bo şêwirmendiya bi rêya Vîdyoyê amade ne.

## **Xizmetên ji bo dê û bav, xwendekar û personelên dibistanan.**

### **Şêwirmendiya Mijaran:**

- Xwarina tendurist çi ye?
- Tendurustiya canê xwe çawa biparêzim?
- Piştî kîjan semptoman divê meriv here doktor?
- Zarokê min yê nexweşê kronîk li dibistanê çawa ye?
- Ji bo kîjan nexweşîyan kîjan doktor hene û muayene çawa çêdibe?
- Meriv ji bo derman-kirinê û muayenê çawa serî lê dide û hwd.

### **Navbeynkarî**

Eger zarokê we hewcedarê muayeneya tendurustî be, em ji bo dîtina doktorekî/a munasib, navendeke şêwirmendiyê an jî klînîkekê an jî ji bo girtina randevûyekê bi kêfxweşî alîkariya we dikan.

## **Xizmetên ji bo dê û bav, xwendekar û personelên dibistanan.**

### **Refaqet**

Ger hûn bixwazin, em dikarin ji bo randevûya ewil bi doktor re an jî bi navendeke şêwir-mendiyê re, refaqeta we bikin.

### **Xizmetên Komî**

Li gel şêwirmendiya takekesî, em li navendêne malbatêni dibistanêni seretayî derbarê mijarêni tendurustiyê de ders û xizmetên komî jî didin.



Xizmeta rehberiyê ji bo tendurustiyê, xizmetek e ku ji aliyê departmana tendurustiyê ya Kolnê tê dayîn. Hemû xizmet bi dilxwazî ne û bê pere ne. Ger ev xizmet bala we dikişîne, ji kerema xwe re bi rehberên tendurustiyê yên dibistana xwe ya seretayî re an jî bi rêya [Gesundheitslotsendienst@stadt-koeln.de](mailto:Gesundheitslotsendienst@stadt-koeln.de) bi mere bikevin têkiliyê.

Aniha em li dibistanê li jêr dixebeitin:

- GGS Konrad-Adenauer-Straße
- GGS Merianstraße
- GGS Riphahnstraße
- KGS Langemaß
- GGS Lustheiderstraße
- GGS Zehnthalhofstraße /  
James-Krüss-Grundschule
- KGS Zehnthalhofstraße
- GGS Ketteler Straße / Schule IM Süden
- GGS Görlinger Zentrum / Schule Kunterbunt

## Gesundheitsamt Köln

Gesundheitslotsendienst an den  
Familiengrundschulzentren  
Neumarkt 15 – 21, 50667 Köln

Telefon: 0221 / 221-32419

Fax: 0221 / 221-24036

gesundheitslotsendienst@stadt-koeln.de

Li vir hûn dikarin vê broşurê  
li ser zimanêن din bibînin:



## Die Oberbürgermeisterin

Gesundheitsamt  
Amt für Presse- und Öffentlichkeitsarbeit

Dîzayn û Çap  
Zentrale Dienste der Stadt Köln

Bildnachweis

Titel: Rido / stock.adobe.com; SolStock / iStock.com